Îdolojî di edebiyatê de

Ebdilhemîd Mendanî

Dibe ku her îdolojiyekê rêkek wêjeyî çêkirî hebe, dîtina xwe bo edebiyatê bide diyarkirin ji bo ku pê re bigehe. Dibe ku her torevanekê awayek cuda hebe ji bo ku xwe pê bigehîne xwandevanan.

Ango, her xwandingehek edebiyatê, herweha hunerê, rêkek îdolojî xweser heye.

Gelek boçûnên hunerî yan edebî, dengvedana hindek rêbaz û îdolojiyên kevn in dûrî serdemê xwe, lewra jî her deqek edebî demê ku dihê diyarkirin, ka ji kîjan corî ye, rexne ji heman corî lê dihê kirin.

Gelek caran buhayekê mezin ji bo torevanî hatiye dan, ji ber ku ew bi xwe yek e ji rêkxistiyên îdolojiya xwedan desthelat. Wekî din jî, ango gelek caran torevan hatiye wendakirin çunkî ne bi îdolojiya wî demî re ye, demê ku ew tê de.

Hindek rexnegir palpiştiya wan têkstên edebî dikin, yên ku li gel îdolojiya wan diguncin, belê ew tekstên ku li gel îdolojiya wan neguncin, nevên, bê ku astê kesê dahîner li ber çav werbigirin, renge ji ber ku buha û prensîpên edebiyatê yên lihevhatî nas nakin. Dibe ku torevan di edebiyatên xwe de rêbaza xwe ya îdolojî biguhore, herwesa çêdibe jî xwe têkelî hindek rêbazên din bike, ev jî ji bo têkilbûna arêşeyên civakî û hizrî dizivire, bo nimûne: di civakê erebî de bi giştî û di yê Sûrî de bi taybetî, gelek rûdanên rojane pêdivî bi têkilkirina civakî û neteweyî hene. Ev çende jî behra bêhtir di nav romanan de diyar dibe renge çunkî romanê pêdivî bi xwegirtin û gehiştinek temam heye. Li vê derê, nabe rexnegir di navbera têkstên edebî de bibe gez û bi kêfa xwe hindekan feramoş bike, bihavêje, yan hindekan pesend bike. Pêdivî ye li ser rexnegirî hemû tewerên siyasî û hizrî, bi taybet yên ku bi serê romanê hatîn, li ber çav werbigire.

Dr. Feysel Simaqî, ev kêmasî hemû, bi hindek karên veguhaztinê peywendîdar dike, herwesa awayên çêkirin û arastekirina awayên bo edebiyatê diyar kiriye bi taybet ketwarê rexneyî û ketwarê hevbehr, bo nimûne: dibe ku nivîskar di karekê de ketwarek hevbehr be, lê dibe ku di karekê din de ketwarek rexneyî be. Heger em berhemên "Elicêl" bixwînin, em dê kilasîka nû û taze li gel siruştî bibînin, lê heger em berhemên "Hene Mîna" bixwînin, em dê ketwarek rexneyî li gel ketwarek hevbehr bibînin. Ev dudilî di hevcorkirina romanê de bûye egerê cudayiya bîrûboçûnên rexnegiran di romana ketwarê rexneyî û romana hevbehr de. Rexnegirek dê vê romanê bi çavê ketwarê hevbehr bibîne û rexnegirek din dê bi çavê ketwarê rexneyî bibîne. Ev, ji bo têkilkirina serûrûyê herdu ketwaran di romanekê de nazivire; belku bo rexnegirî û îdolojiya wî, bo serbor û şêwazê wî yên kesayetî dizivire.